# Newroz



Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988





Osman Sebrî
1905 - 1993

Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de

Hejmar ( 87 ) | Tebax | 2009 z - 2621 k | Buha ( 15)


## Turkiye… Gavek Li Pêş

Hukûmeta Anqerê bi rêvebiriya parta AKP û serokwezîr birêz Receb Teyib Erdoxan, di derbary pirsa Kurd de, gavek li pêş davêje, dema ku, li vê dawiyê, bi awakî vekirî, rasterast û aşkere kir ku: ( dewleta Turkiyê di derheqê Kurdan de, gelek şaşî kirine…)

Di dîroka Turkiyê de, eve cara yekemîne ku, daxuyaneke weha ji dev û lêvên serokwezîrekî li ser serê kar, ji raya giştî re tê gotin, Lewre jî, hemî deriyên daxuyan, nivîsar, manşêst û helwestên rengareng û tersîhev vebûn, û têra xwe hêz û bartiyên siyasî, rewşenbîr û rêxistinên Kurdan bi vê yekê mijûl bûn û hê jî berdewamin û yê pir ma ye.

Jêderên Anqerê dibêjin ku, eve destpêka çareserkirina pirsa Kurda ye û parta Erdoxanx wedê giravî- di vî warî de, xwedî piroje û biryar e.

Di vî warî de, wezîrê hundirî, birêz Beşîr Atalay û yê derve birêz Ehmed Dawûd Oxlo jî, di derheqê pirsa Kurdî de, daxuyaniyên erênî dan. Vêca Kurd weke dixuyê, li hêlekê dixwazin şa bibin û hêviyên nû ava bikin. Li hêla dine, bi tirs û kêmbawerin ku, hukûmet li gor peyv û sozên xwe be, û bêje: (( Duh duh bû, îro îro ye)). S. Demirel.

Çi bibe û çi nebe, civata perlemana Turkiyê ya ku, di rojên bê de lidarkeve, dê bibe xuyakirin ku, berê siyaseta dewletê bi ku ve ye, û AKP ta çi derecê li helwestên xwe yên erênî di derbarey Kurdan de, dibe xwedî, û serê xwe li ber bayê şovenîzim û nijadperestiya hin hêz û partiyên Turkan netewîne.Wê hingê tabloya siyaset û helwestan, dê zelaltir bibe.

**D. R ( 2 )**


Email : Newroz 95 @ hotmail . com



**Pirsa Kurd …** — Azad Kurdî — 4

**Kesatiyeke Balkêş** — Enehîte Morad — ٥

**Pirtûkxana Kongirês** — Wergerandin : Memê Alan — 6

**Her diçe….** — Rêberê Silîvî — ١٢



www.arsivakurdi.org

***Nûce û Calakî*** ***Nûçe û Çalakî***

## Ola Êzîdîtî



Ola Kurdan ya herî Kevin, Êzîdîtî, li Rusiya, li gorî daxuyana serokê komîteya Ol û Terîqeyan, Alexander Dvorkin weke Oleke fermî tê pejirandin. Hêvî ew e ku li hemî welatan Ol û netew werin pejrandin.

## Fastîvala Helbestê ya Kolompiya



Li bajarê Medelin, li Kolompiya, festivala cihanî, bi beşdariya 70ê helbestvanî li dar ket.ji nav wan helbestvanan, yekem car e ku helbestvanekî Kurd birêz Husên Hebeş – ji Kurdên - Sûriyê- beşdar dibe .Li ser festîvalaê birêz Husên Hebeş weha dibêje: " Bi kurtî, karê ew pê radibin karekî bi rûmet û cihê serbilindiyê ye…

Tiştê herî balkêş di festîvalê de ew bû ku bi hezaran kes dihatin ji bo helbestê, û ji bo guhdarkirina hastên helbestvanan… Gava me dixwend milet bi dil, giyan, guh, çav û bi hemû hastên xwe guhdarî me dikirn. Bi rastî tiştekî ne normal bû

. Di festivalê de, ez weke helbestvanekî Kurd ji sûriyê hatim pêşkêşkirin."

**Dumahîk : Turkiye..**

Lê, divê bête zanîn ku, bona çareserkirina pirsa gelê Kurd, ji riya aştiyane pêve, tu rê yên dî nînin. Lewre jî şêweyên demokratîk û şaristanî di danûstandin, gotbêj û diyalogan de bona naskirin û rêzgirtina maf û berjewendiyên hemiyan, doz û daxwaza herî pêwîst, zor girîng û dîrokî ye, ji ber ku , li cî ye û hew.

**Sînorê Yekta**

**15 ê Gulana 2009 an**

Birûsk

## Ji Komîta Şevbuhêrkên Kurdî li Şamê re

Xwîşk û birayên hêja… Beşdarên birêz…

Bi bûneya 6 saliya damezrandina Komîta we, **Komîta Şevbuhêrkên Kurdî li Şamê**, bi navê weşana NEWROZê, em we pîroz dikin, û hêviya berdewamî û serkeftinê ji karê we re dikin.



Hêvî û dilxwaziya me ew e ku em hemî bi hev re ji bo geşkirina zimanê kurdî di civakê de kar û xebatê bikin û evîna xwendin û nivîsandina bi zimanê dê, zimanê me yê kurdî belav bikin.

Bêgomne ku çalakî û xebatên we yên pîroz di warê lidarxistina şevbuhêrkên Kurdî de cihê dilşadî û şanaziya me ye, û bi dilgermî em karê we destek dikin.

Careke din em we pîroz dikin, hêvîdar in ku xebata we ya ji bo zimanê Kurdî her berdewam be.

**Weşana NEWROZ**

31.07.2009Z-2621 K

**Abeya zimanê Kurdî**

**A**beyên zimanê Kurdî( alfeba) yên ku di nav gelê Kurd de li Sûriyê belavkirî , û ji bo fêrkirinê têne bikaranîn gelek in . Lê , li gor çavdêriya mamostên zimanê Kurdî gelek kêmkasî di wan de têne dîtin .

Ji ber wan têbînan , mamoste Merwan Berekat bi hevpişkiya mamoste Memê Alan û bi alîkariya pêşinyarên hêja yên gelek mamosteyên mîna Pertewê Şerqî , Apê Osnebir û bavê Ciwan , Abeyeke zimanê kurdî , rengîn , lihevhatî , bi Kurdiyeke xwerû , hevokên xweşpîvayî , bi erêkirina wzareta ragiyandinê , çapkir û belav kir.

Cara yekê ye , ku berhemeke ferkirinê bi ked û cefakî komelîn ên gelek mamostên zimanê kurdî , û di gel sûdegirtina ji gelek abeyên di nav lepan de , çi yên kurdî û çi jî yên biyanî , derdikeve û jiyanê dibîne .

Hêvî û armanc ji vî karî , ku ev abeya nû , pir belav bibe , di gelek malên Kurdan de cî bigre , û komît û saziyên zimanê kurdî bi wê zarok û mendal û nûhtiyên zimên fêr bikin .

www.arsivakurdi.org

## Bîranîna Dr. Nûrî Dêrsimî



Di sala 1892 an de, li gundê Axzonik, herêma Dêrsimê ji dayîk dibe. Xwendina xwe li Xarpût û Stenbûlê beşê bijîşkê( bêtera) kuta dike û piştî xwendiana xwe kuta dike, dibe rûnştvanê Ezirganê. Di zanîngehê de xebata xwe ya Kurdayetî berdewam dike, derbasî nav refê komela Hêvî dibe û di komela xwendekarên Kurdistan de jî dixebite.

Di serhildana Dêrsimê – 1937 - de, ya bi seroktiya nemir Seyêd Riza, Dr. N. Dêrsimî dibe şêwirdar, bîrewer û aqilmendê serokê serhildana Dêrsimê. Piştî têkçûna serhildana Dêrsimê, Dr..Dêrsimî neçar dibe ku penaberî Sûriyê bibe û dibe rûniştvanê bajarê Helebê.

Dr. N li Heleb, di nav Kurdên Kurdaxê de jiyana xwe derbas dike û têkliyên xwe bi siyasetmedar, Kurdhez, Bedirxanî û Kurdên ku peneberê Sûriyê bûne re domdike û alîkariya doza Kurd dike.

Li bajarê Heleb Dr. N.D du berheman. 1- Kurdistan Tarîxinde- Dêrsim . 2 Hatiratim dinivîse. Lê mixabin herdu pirtûk jî, ji aliyê rijêma Sûriyê ve têne qedexekirin.

Lehengê serhildana Dêrsimê, li bajarê Heleb, di Tebaxa 1973an de, koça dawî dike û li Ziyareta Henên- Kefer-cenê- Kurdaxê ( li gor weseka wî) tê veşartin. Daku bayê Dêrsimê bi ser de were û serê xwe li ser axa ku ji dêrsmê jê re hatiye datîne.

Li ser gora lehengê Dêrsimê weha hatiye nivîsandin :

Dilbirînê bi nalîna welat. Mihemed Nûrî kurê mele Îbrahîm Colik Oglo. Li ser vê riya dijwar. Min jî kire pir hawar. Da ji bo we rojekê. Dinya bibe gulbuhar.

*Jêder : malpera Avesta*

## Semîh Şiqêr û Strana Li Ser Kurdan



Semîh Şiqêr stranbêjekî Ereb e, bi stranên xwe yên siyasî, mirovatî û evînî tê naskirin. Dibêjin ku ew komonîst e. Lê, ew dibêje : Ez mirovekî serbixwe me. Di /20/ Avdara 1985 an de, çûye bajarê Hesekê ji bo li şevek helbesê ya hevalê xwe yê Kurd Hesan Izet beşdar bibe. Li wir bala xwe didiyê ku tevgera bajêr ne normal e. Ez pirsîm çi heye?. Gotin siba Newr û birayê xwe Hesan em ranezan, Ji ber ku di nêrîn û mêjiyê min de, stranbêjê Kurd Şivan perwer weke sembol û hevalekî xwe min didît . Ez û Hesan Îzet di nivîsandina gotinekê ji bo Newrozê me alîkariya hev kir û me strana xwe bi dawî kir , tevî ta niha min û Şivên hevdu nedîtiye. Di Newrozê de,, heyejaneke pir mezin hate min û hêviya min ew bû ku ez wê stranê diyarî Kurdan bikim.

Lê, sedcar mixabin, komên Folkilorî yên Newrozê, rê nedan ku ez wê stranê diyarî wan bikim. Ji ber ez ne girêdayî me bi tu partiyan ve.

Strana Semîh Şiqêr ev e:

**Hevalekî min heye ji Kurdstan**
**Navê wî Şivan e**
**Dengê wî di bale de**
**Wek dema ku di Newrozê de agir li ser çiya vêdikeve**
**Bistire Şivan bêje**
**Bêje û mizgîniya paşerojê bide**
**Xatîra xwe bi cerg**
**Di wê dûraniya wêrek de vêxe**
**Em I hêviyan yek in**
**Me heye yek rêç**
**Ka em bi hev re pêxînin**
**Da ku were**
**Ew kêfa em hemû li hêviyê ne**
**Ew roja ku em wê pîroz bikin**
**Li ser çiyayên bilind**
**Li ser çiyayên bilind**

*Jêder : malpera Avesta*

Amedeka: Hesenê Cumî

www.arsivakurdi.org


## Pirsa Kurd Pirsgirêka Herî Giring Ya Turkiyê...

Azad Kurdî

Ev sernivîs gotina çend rojan berî niha a Serok Komarê Tirkiyê, Ebdulah Gul li bajarê Bedlîs a Bakurê Kurdistanê ye. Daxuyanî û hewl û xebatên yek du hefteyên borî ên karbidestên payebilind yên Tirkiyê li ser giringiya Pirsa Kurd û çareseriyên wê dozê ji rêya aştîxwazane û demokratîk ve, ev pirs di 20-30 salên borî de ji her dememkê zêdetir xist rojeva siyasî a Turkiyê. Demekî dirêj bû Erdogan daxwaza DTPê bo hevdîtin û civînan qebûl nedikir, lê serdan û hevdîtina roja 5ê Tebaxa 2009an a Serok Wezîrê Tirkiyê, Receb Teyib Erdoxan ligel Hevserokên Partiya Civaka Demokratîk (DTP) Ehmed Turk û Emîne Ayna dawî bi wê kirîzê û pirsgirêkan anî û hêviyekî nû da pêvajoya çareseriya siyasiyane a wê pirsa girîng û hestyar a Komara Turkiyê ku zêdeyî 80 sal dibe pê re dinale . □avdêrên siyasî û siyasetvanên Kurd û Turk gavên vê dawiyê ên karbidestên Hikûmeta Dad û Pêşdeçûnê (AKP) û civîna Erdoxan û anda DTPê û herwiha daxuyanî û helwêstên Serok Komar û çend wezîrên dewletê derbarê çareserkirina aştiyane û demokratîk a Pirsa Kurd li Turkiyê wek guhertineke kûr û mezin di proseya çareseriya pirsgirêkên navxwe ên wî welatî dizanin û herdu aliyên hikûmet û DTPê jî pêvajoya nû û helwêst û gavên dewleta Turkiyê li dor vê pirsa giring a Turkiyê biwêrane, erênî û cihê hêviyê nirxandin û vekirina deriyekî nû bi rûyê çareseriya Pirsa Kurd hesibandin.

Lê ji aliyekî din jî ev daxuyanî û hewl û civînên navbera du aliyan, bi dijberî û helwêstên tund ên her du partiyên mezin ên opozîsyona hikûmetê re, anku Partiya Komarîxwaz a Gel (CHP) û Partiya Neteweperest a Gel (MHP) rûbirû bû û wek ivîna AKPê û PKKê û wd... binav kirin.

Helwêsta van du partiyan zêde di çarçoveya lojîkek □ikestxwarî û nejadperestane tê berçav ku di yek du dehsalên borî de li hember Pirsa Kurd ji aliyê wan dihat me□andin, ne rexneyekî pê□gîrane li hember proseya çareseriyê an dijberiyek siyasî û mantiqî a partiyek opozîsyonê. Ji ber ku di dewrana desthilatdariya wan û partiyên din de, pirsgirêkên navxwe ên Turkiyê gelek kûrtir bûn û nerîn û ramana înkarkirina pirsa Kurd û nasnameya netewî a neteweyek zêdeyî 25 milyon nifûs li Turkiyê û herwiha domandina şer bi tevgera mafxwazane a Kurdistanê re di wî parçeyî de bû, niha ku Hikûmeta AKPê di dema van çend salên borî de hin gav û projeyên herçiqas biçûk bin jî, bo çareserkirina Doza Kurd avêtine û dixwaze çareseriyekî kûrtir jê re peyda bike û lojîkî bi pirsê re tevbigere û pirsê bi rêya aştîxwazane û demokratîk û gotûbêjan ve çareser bike, ew du hêz wek berê ketine helwêstgirtina nejadperestane û dixwazin mezintirîn pirsgirêka navxwe ya Turkiyê ku Pirsa Kurd û binpêkirina mafê mirovan e, bê çareserî bimîne. Bêguman ev nerîn û gavên ku niha AKPê davêje û tîne rojevê, ger di dema du dehsalên borî de hatiban kirin, Turkiye di asta navnetewî de rol û rewşekî cuda ji ya niha dibû. Bi taybet ji bo endambûna Turkiyê di Yekîtiya Ewropayê de. Dibe helwêst û daxuyaniya herî giring a Serok Komarê Turkiyê Ebdula Gûl li bajarê Bedlîsê be ku li ser pirsê wiha axivî: "Pirsa Kurd, pirsa herî giring a Turkiyê ye û pêwîst e ew pirs bi şêwazekî siyasiyane û demokratîk bê çareserkirin, ji ber ku ew doza hemû Turkiyê ye û divê Tirkiye wek welatekî modern û nûjen wê pirsa giring a xwe ya navxweyî çareser bike û pêngavan jê re bavêje.



Ketine rojeva Pirsa Kurd li Turkiyê vedigere bo destpêkên dehsala 90 a Zayînî a sedsala borî ku bo yekemîn car jî dîrokzan û ronakbîrê navdar Dr. Ismaîl Beşîkçî di teza xwe ya duktorayê de bi awayekî akademîk û realîte Doza Kurd xiste rojeva siyasî a Turkiyê û li ser wê pirsê çend caran cezayên giran ên girtîgehê ji Beşîkçî re hat birrîn. Piştre di sala 1993an de, Serok Komarê wê demê yê Tirkiyê ku xwe Kurd dizanî, rastiya hebûna Pirsa Kurd anî rojevê. Lê heta çend salan berî niha jî baskirin ji wê mijarê hêla sor û xeter a Turkiyê dihat hesibandin. Bi taybet ji bo Arteş, partiyên nejadperest û nasyonalîst ên Turk. Lê gavên van çend salên borî ên Hikûmeta AKPê guhertinek mezin li civaka Turkiyê û di nav rewşenbîr, siyasetvan û medyayan de pêk aniye û fezayekî erênî çêkiriye.

Nemaze vekirina Kanala TRT6ê D . R ( 11 )

www.arsivakurdi.org

# Kesatiyeke Balkêş

Enehîte Morad

Ma gelo kî rêjesorê rêzdar û nemir Yalmaz Gunê nasnake tenê merem û dilxweziya me ji vê kurtebirîn nivîserê li ser jiyana ew lehengê hunerê rawestin , belkîm em karibin sudê ji vîn û pêdariya wî bigrin û ji derya zanîn û hişmendiya wî pir tiştan hîn bibin ! ji ber ku , jiyana hunerimendê hêja destaneke serbixwe û taybetmend e .

Di Nîsana -1937- an de , li Gundê yenêdce nêzîkî bajarê Edenê ji dayêkê bûye , navê wî yê sêserî Yalmaz Hemîd Ogilo Bêyton e . bavê Yalmaz ji kurdên Zaza ji Gundê Siwêrek û ji kesên xizan , perîşan bû tembûrvanekî bi nav û deng bû Diya Yalmaz , Gulê ji eşîrên Mûşê ye , ji malbateke pir dewlemend û zengîn e .Ewli bajarê Edenê pêrkî bavê Yalmaz hat, hevdû nasdikin piştre dizewicin . Diya wî di jiyana xwe de, pir êş û kedê dibîne , du zarokên wê çêdibin Yalmaz û xwîşa wî Leyle bi du salan ji Yalmaz cûkitire ,ligel rewşa xizanî heyama malê di kêf û xweşiyê de bû ?!. Lê mixabin piştî rewşa aborî hinekî geş û pêş dikeve, bavê wî careke dî dizewice , hingê temenê Yalmaz şeş-hefit saliye. Vêca jî , hêmenî di malê de namîne her roj şer û kotek hene pirên caran li pêş cavên Yalmaz li diya wî dihate xistin û ew ji malê diqewtandin .Bi vê awî êş û janên demê li Yalmaz dicivîn, xemgîn û melûlî di temenê şeş –hefit-saliyê de dikir ku, rebenê Yalmaz û ji bo alîkariya diya xwe , di pir waran de kar dike , hin caran weke berdest li ser rêkan Fistiq, Guz,û Findiq gigel rojnamên rojane difrotin . Li dawî di fabirîqa sînemê [pêlweş] de kar dike wisan jî rastî qeder û narvîna xwe hat, xwendina xwe ya seretayî li bajarê Edenê kuta dike .Di temenê sêzdesaliyê de dest bi karê hunrî dike , di salên -1953-an 1954an de kurteçêrok û gotaran ,ji çêrokên wî yên pêşî û bi nav û deng [mirin bang min dike )e, di sala -1956-an de xwendina xwe ya navîn li bajarê Edenê kuta dike û sala -1958-an li zanîngeha Stembûlê beşê Aborî dixwîne . Rêzdar Yalmaz Gunê mixabin -47-salan dijî jê -11-sal di binê hepis û zîndanên tirkan de weke kurdekî ramyar û dilsoz ji ber cidahiya rêjûma bêbext derbas dike û pir êşkence û lêdanên curecur li serê wî dimeşînin. Loman jî nemirê gewire hêmenî û hevpîvanê di jiyana xwe de nabîne lê belê, zanyarê hêja tu carî serê xwe ji rêjîma teres û nemirone re natewîne ,bi serbilindî ji xebata xwe namîne û di riya hunerê re êş û serpêhatiyên gelê kurd û tirk re diyarî raya giştî li der û hundir dike, rêjîma tirk tazî , şermeze riswadike . Vêca jî, jiyana wî ya hunerî pir zengîn û dewlemend e,ew di -110- filman de rolên sereke lîstiye - Sîneroya -53-filman nivîsiye – Derhênera 17 filman û çar jî weke rêjîsorê alkar -4- Romanan û bi sedan cêrok nivisand , nav û degê hunermendê gewre Yalmaz Guney li seranserî cîhanê belav dibe û pir xelatan distîne weke : xelata filmA –kerî – di konsera Cîhanî ya li Logerno, li bajarê Siwêsira .. Xelata filma Hêvî di kosera cîhanî li bajarê Gêrtobil .. Xelata [Elsive Elzehebiyê ] di konsera kan de, hingê Yalmaz di binê hepisê de bû , jina wî ya bi navê Fatime Guney werdigire ! nemir Yalmaz -3-ê caran dizewice,jina yekem keçike wî jê dibe û ya duwem bi hunermeda turk re – Nebehet Cêxir-re dizewice û ew jî keçikê tîne , Yamaz diçe leşkeriyê hevdu berdidin . Di sala -1970-ê de û piştî leşkeriê bi dawî dike, bi hêviyên pir bilind vedigere Stembûlê , keçike çeleng bi navê Fatiş( Fatime ) nasdike û pêre dizewice û kurkekî tIne , navE wî jî Yalmaz lêdike ,zor mixabin ew pênc salan bi Fatimê re djî û neh salan jî dûrî wê û kurê xwe di binê zindanên tirkan de derbas dike. Di sala -1981-an de ,bi boneya hatina Cejina qurbanê hefteke rêdan didine wî û rengî keys dikeve wî û ji turkiyê bazdide û direve Yonanistanê . Bizavkirina penaberryê ,ji hin dewletan dike,lê ji ber berjewendiyên wan bi tirkan re daxweza wî napejirînin ,li dawî li dewleta Firansa li bajarê Parîsê cîwar dibe û di -9-êlûnê de sala -1984-an diçe dilovaniya xwedê !?. Bêguman ew hunermendê rewşenbîr û nemir , bi laşê xwe ji pêş çavan diçe lê îro brhemên wî weke sermiyan ji hemû kesên xwedî bîr û bawerî re nemaze ji gelê kurd re diyar in . Vêca jî, pêwîste û çi pêwîste ku , ciwanên me kurdan jiyana ev mirovê rêzdar nasbikin, daku karibn ji kaniya wî hînî pir tiştan bibin û li ser riya wî bimeşn .

***Jêder pirtuka Yalmaz Guney nivîsar : E.E.husênof .Wergerandin ji rosî ra êrebî mamosetya gewre: Leman Ibrahîm***

www.arsivakurd.org

**Hevpeyvîn: ALİ GULER/ERDAL ALIÇPINAR-ANF/ BRUKSEL**

**Werger: Mehabad F. ARDA / Amîda Kurd**

**2009-08-26** - Aram Tîgran… Gelek ji me xwediyê strana'Ey Dîlberê' ji ekranên



televizyonan, an jî ji ser dikên konseran dinasin. Lê gelo em di rastiyê de Aram çiqasî dinasin? Hevjîna wî Sîrvat Malîkyan Tîgran vegot: "Ew hunermendekî mezin û alîgirê aştiyê bû." Piştî hewldanên dirêj ên brokratîk û dîplomatîk jî, wesiyeta Hunermandê muzîka kurdî û Êrmen Aram Tîgran a veşartina li Amedê, bi cîh nehat. Ev yek jî, bi qasî mirina wî, bû sedema keserek mezin di dilê dostên Aram û hemû Kurdan de û di nav wan de şopên kûr hişt. Derdora siyasî ya Kurd, di bin vî barî de elçiqî, lewra ji destê wan tiştek nehat. Aram Tîgran, li sirgûnê ji dayîk bû û li sirgûnê çû ber dilovaniya Xweda. Aram Tîgran Êrmen bû û kurê malbatek bû ku ji komkujiyê rizgar bûbû. Nebiyên kesên ku malbata Tîgran şandin sirgûniyê, îroj destûr nedan cenazê Aram bibine Amedê. Aram Tîgran, niha li sirgûniyê radizê. Herwekî Yilmaz Güney, Ahmet Kaya û Nazim Hîkmet.
Bê guman, ku ya herî zêde ber vê rewşê ket, hevjîna wî ya 53 salan, hevala wî û hemraza wî Sîrvat Malîkyan Tîgran bû. Bi qasî wendakirina Aram, êşa wê ya verêkirina Aram a li sirgûniyê jî mezin bû. Di merasîma cenazeyê Aram de hêstirên çavên Sîrvat Malîkyan û şîna wê, herkesî bi girî vekir. Bi taybet jî li hember gotinên wê yên ku bi "Aramê min îro bê hal e" dest pê dikirin, kesekî li ber xwe neda. Hêstirên çavên Kurd û Ermenan, ji bo Aram Tîgran li nav hev ketin.
Me pirsa vî hunermendê ku herdu gelan anî ba hev, ji jina wî kir. Êşa xwe di nav xwe de veşart û got: "Peyama min ji Kurdên ku Aram hemêz kirin re heye: Aram evîndarê gelê Kurd bû. Heya ku mir jî ji bo kurdan xebitî. Kurdan jî îroj ew hembêz kirin û li çar aliyên cîhanê ew bi bîr tînin. Ez spasiyên xwe pêşkêş dikim. Ew îroj li sirgûniyê ye, lê dê rojek teqez biçe Amedê. Hevalên wî kurd dê giyana wî şad bikin."

**'EZ Ê ROJEK BIMIRIM LÊ DIVÊ EZ LI DÛ XWE DÎROKEK BIHÊLIM'**

***-Em Aram Tîgran ji ekranên televizyonan, li ser dikan, di destê wî de cumbuş û bi rawestana wî ya entellektuel dinasin. Ji bilî van hemuyan, Aram Tîgran kesek çewa bû?***

-Ez 53 sal in bi Aram Tîgran re zewicandî me. Ew mirovek wisa bû ku timî li dû aştiyê baz dida. Ev Kurd e, Ermen e, an ji gelek din e, ferqek wisa tu carî nedikir. Aram Tîgran, beriya her tiştî bi hestên saf û pak dostê Kurdan bû. Bêyî hesab û berjewendiyan, Tu carî ji bo tiştên madî yên cîhanê nejiya. timî weha digot: "Ez ê rojek bimirim, lê divê li dû xwe dîrokek bihêlim." Ez îroj baştir bi vê gotina Aram têdigêhêjim. Dinihêrim; di serî de Kurd û Ermen, gelek kes şîna Aram Tîgran digirin. Ev ji nêzîkayiya wî ya ku tu ferq û meylê nedikir navbera gelan tê.

**DI MUZÎKÊ DE TIMÎ STÎLEKA WÎ HEBÛ**

*-Muzîk ji bo Aram Tîgran dihat çi wateyê?*

-Aram Tîgran, ne tenê şirovevanek bû. Di heman demê de besteyan çê dikir, notayan durust dikir û ensturman lê dida. Tu carî stranên kesên din nedigot. Timî besteyan çê dikir, notayan durust dikir. Timî dixwest tiştên nû çê bike. Ew kesekî hilberîner bû û li dû nûbûnan baz dida. Digot: "Divê ez tiştên wisa çê bikim ku bi kesekî re tunebin." Cudahiyeke Aram Tîgran hebû: Ji roja ku dest bi muzîkê kiriye û heya niha yek stîleka wî bi tenê hebû. Dengê xwe jî li gor vî awayî bi kar anî. Bi kinayî, muzîk ji bo wî jiyan bû.

***-Gelek beste çê kirin, bi sedan stran gotin. Herî zêde ji kîjan stranên xwe hez dikir?***

-Aram Tîgran, ji hemû stranên ku digotin, hez dikir. Hemû jî ji bo wî bi rûmet bûn. Lewre muzîk û huner ji bo Aram Tîgran jiyan bûn. Lê herî zêde ji berhemên xwe "Ey Dîlberê, "Çîyayê Gabaro" û "Şev çû" hez dikir. →

www.arsivakurdi.org

**STRANÊN XWE BI ERMENÎ DINIVÎSÎN**

***-Stranên xwe bi kîjan zimanî dinivîsîn?***

-Bi Ermenî dinivîsîn. Lê ji bilî kurdî, bi yunanî û erebî jî digot, bi zimanekî pir sade û vekirî. Bi kîjan zimanî jî bigotana, mîna ku ji wî gelî be digot. Kesî nedizanî ku ji netewek din e.

**BI ZIMANÊ DAYIKÊ BI ZAROKÊN XWE RE DIAXIVÎ**

***-Li nav malê hûn bi hev re bi kîjan zimanî diaxivîn?***

Dê û bavên me tu carî bi zimanekî din bi zarokên xwe re nediaxivîn. Digotin: ”Bila zimanê xwe yê dayikê hîn bibin. Dema mezin bûn, dikarin zimanên din jî hîn bibin.” Ji ber wê jî bi zarokên xwe re bi ermenî diaxivîn. Lê dema dihatin ba hev, bi hev re bi kurdî diaxivîn. Em jî bi ermenî û kurdî diaxivîn. Hemû zarokên me bi kurdî dizanin.

***-Têkiliya Aram Tîgran û civaka Ermen çewa bû?***

-Di komkujiya Împaratoriya Osmaniyan a li dijî ermenan de, Kurdan jî bi nezanî rol lîstin. Osmanî Kurdan bi kar anîn. Lê heman Kurd, jiyana pir malbatên Ermen jî rizgar kirin. Mînak; malbata me jî yek ji van malbatan e.

Li gel van hemuyan jî, îroj gelek Ermen nerazîbûn nîşan didin. Em di bawerkirina wan de zahmetî dikşînin. Kurdên wê demê ji bo kesên din dixebitîn. Lê Kurdên îroj, pir cuda ne. Hemdem in û doza aştiya navbera gelên li herêmê dikin. Em di dawî de Ermen in. Lê hin Ermen, ji bo ku em bi kurdan re tevdigerin, me ji derî xwe dihiştin. Lê li gel vê jî, Aram Tîgran timî bû pira biratiyê. Mînak; bawer nedikirin ku dê Kurd ew qasî xwedî li Aram Tîgran derkevin. Îroj gelek ji wan şaş mane. Mîna ku ji kiryarên xwe yên heya niha poşman bûbin. Aram Tîgran, rola xwe ya pira aştiyê, di mirina xwe de jî lîst. Îroj Kurd û Ermen bi hev re ji bo wî hêstiran dibarînin.

**HEYA ROJA MIR JÎ LI GEL KURDAN MEŞIYA**

***-Aram Tîgran, digot ku dostaniya wî ya bi Kurdan re, wesiyata bavê wî bûye. Hûn dikarin hinek vê yekê vebêjin?***

-Kurdan malbata me ji komkujiyê rizgar kiribûn. Bavê wî jê re digot: “Tê bibî hunermend û heya mirinê bi Kurdan re bimeşî.” Wî jî ev pêk anî. Aram Tîgran hîn 9 salî bû cumbuşê da destê xwe û hîn 17 salî bû, Qamışlo û herêma wê, bi nav û dengê Aram hesiya.

*-Rolek we yê çewa hebû di jiyana hunerî ya Aram Tîgran de?*

-Ev 53 sal in em zewicandî ne. Ez timî pê re bûm. Belê min beste çê nekirin û nota durust nekirin, muzîk lê neda. Hemû jî berhem û keda wî bûn. Lê min timî ew destek kir û rojek jî ew bi tenê nehişt.

**JI BO AMEDÊ XWE HÎNÎ YUNANÎ KIR**

***-Aram Tîgran di axaftineke xwe de weha gotibû: ”Ez ji bo bikaribim biçime Amedê, di vî temenî de fêrî yunanî bûm û bûm hemwelatiyê wan. Min ev hemî ji ber evîna xwe ya Amedê kirin.” Ev çewa bû, hûn dikarin hinek vebêjin?***

-4 sal berê em çûne Yunanistanê. Timî weha digot: ”Ez divê bibime hemwelatiyê vî welatî. Lewra tenê bi vê riyê dikarim biçime Amedê.“ Ji ber wê jî pir dixebitî. Bi şev û roj ji bo ziman hîn bibe dixebitî. Van hemuyan, ji bo bikaribe biçe Amedê, kir.

**PIR DI BANDORA WÊ GOVENDÊ DE MABÛ**

***-Bû hemwelatî û çû Amedê. Hestên wî yên wê kêliyê çi bûn?***

-Cara yekem derket Newrozê. Pir bi kelecan bû. Lewra salên dirêj timî li hemberî Amedê têkliyeke wî ya taybet hebû. Dixwest biçe wê derê. Piştî bernameya xwe hat û got: ”Ez ê bersiva vê têkildariya mezin çewa bidim?” Min pirs kir; ”Çima?”, ji min re weha got: ”Ez dema li ser dikê bûm, Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemir, parlamenterên berê yên DEPê Leyla Zana û Xetîb Dîcle û gelek siyasetmedarên DTPyî, li ber stranên min govend girtin. Ez dizanim ev kes ne mirovên govendan in. Bi hêsanî li ber stranên her hunermendî ranabine govendê. Ev ji ber rêza wan a ji min re ye. Ez vê yekê pir baş dizanim. Heya dawiya jiyana xwe ez ê vê ji bîr nekim.” Pir di bin bandora wê govendê de mabû.

**TÊKILDARIYA MEZIN EW DI NAV 20 ROJAN DE BAŞ KIR-**

**Dema li Amedê nexweş ket hûn li balê bûn?**

-Dîsa piştî bernameyekê nexweş dikeve. Heval ew radikine nexwşxanê. Doktor jêre dibêjin: “Divê di nav du mehan de tu emeliyat bibî. Eger nebî, em piştre nikarin bi emeliyatê jî te xelas bikin.” Ji min re telefon kir û got”Were”. Ez jî çûme Amedê. Emeliyat bû. Hemû gelê Amedê bi me re bû. DTPyî, şaredar, hemû li ba me bûn. têkildariyeke pir mezin nîşan dan. Piştî ku Aram Tîgran ji emeliyatê derket û çewa D. R ( 8 )

www.arsivakurd.org

hişyar bû, strana “Ey Dîlberê” got. Hemû doktor matmayî man û pirs kirin: ”Ev çi ye mamoste?” Û wî weha bersivand: ”Ez ji nû ve ji dayîka xwe bûm. Çavên xwe nû li cîhanê vedikim. Bê guman ku ez ê bêjim.” Û bi vê têkliya mezin, Aram di nav 20 rojan de baş bû.

Hevalan em li mala Mehmet Uzun kirin mêvan. Hîn nû ji nexweşxanê derketibû. Li gel ku nexweş bû jî, ji pirtûkxanê çend pirtûk derxistin û got: ”Di nav van pirtûkan de pir tiştên xweş hene ku mirov dikare ji wan besteyan çê bike. Divê ez çê bikim.” Tu carî xwe vala nedihişt.

***-Pirtûkên Mehmet Uzun bûn?***

-Belê pirtûkên wî bûn. Piştî ku em vegeriyan Yunanistanê, ji wan notên ku girtibûn, 5-6 beste çêkirin. Notayên wan sererast kirin û ew bi dawî kirin.

***-Tomara deng heye?***

-Na tune. Her tiştî amade kir, lê nekarî deng tomar bike. Ji ber nexweş bû. Doktoran ji bo 4 mehan gotina stranan û lêdana cumbuşê lê qedexe kiribûn.

***-Hûn dê çi bikin bi van berheman?***

-Ez ê wan veşêrim û nedime kesekî. Rojekê, ez ê bidime kesekî ku paşnavê Tîgran li ser e. Ez ê wan ji neviyên xwe re bihêlim.

**PIŞTÎ DERMANÊN LI ATÎNAYÊ NEXWEŞ KET**

***-Angaşt hat kirin ku di encama dermanên şaş de ku doktorek li Atînayê danê Aram Tîgran nexweş ketiye…***

-Piştî em ji Amedê vegeriyan Atînayê, doktorek Kurd ji Sûriyê bi navê Îbrahîm hebû. Aram ji ber ku ev doktor bi kurdî dizanî, çû balê. Dîsa di vegereke me ya ji Amedê de, ji bo xwînê bide çû kontrolê. Lewre diviya ji 15 rojan carekê xwîn bidaya. Doktor jê re derman nivîsîne, wî jî ji doktor re gotiye: ”Min dermanên xwe yên 3 mehan bi xwe re anîne. Dema biqedin ez ê bêm.” Doktor jî gotiye: ”Wan dermanan bikar neyne. Ez ê dermanên nû bidime te.” Piştî ku Aram nerazîbûn nîşan daye jî, doktor gotiye: ”Wê demê ez ê li te nenihêrim.” Hat malê û vê bûyerê vegot. Min jî jê re got: ”Here doktorek din.” Lê Aram got:. ”Ev jî doktor e, dizane. Tiştek nabe, ez biçime balê.” Heta ku carek doktorên Amedê li doktorê Atînayê geriya ne û gotine ku te çima dermanên weha dane Aram.

Bi rastî jî, dermanên ku doktorên li Amedê danê, lê dihatin. Piştî ku dest bi bikaranîna dermanên doktorê li Atînayê danê kir, xerab bû, xwîna wî av girt. Piştî 15 rojan jî ji xwe ve çû û me ew rakir nexweşxanê. Em dê mîna malbat dû vê yekê bernedin. Ev doktor bû sedema mirina Aram. Ne şekir, ne kolestrol û ne jî nexweşîneka din a Aram hebû.

**SED SAL JÎ DERBAS BIBE DÊ WESIYATA ARAM PÊK BÊ**

***-Dewleta tirk destûr neda ku cenazê Aram bibine Amedê. Ji bo vê hûn dê çi bêjin?***

-Dewleta Tirk zalim e. Dewleteke qetlîamkar e. Di hemû dîroka xwe de li ser gelên cîran zilm kirine, pêkutî kirine. Bi qasî ku ji bedena bê can a Aram Tîgran bitirsin xwe xistin.

Lê sed sal jî derbas bibe, dê wesiyeta Aram Tîgran were cîh. Dê giyana wî şad bibe. Ew dê rojek ji sedî sed biçe Amedê. Temenê min têre neke jî, hevalên wî û Kurd dê wî bibine Amedê. Baweriya min bi vê yekê xurt e.

***-Her çendî Aram Tîgran ermen be jî, bi Kurdan re bûye yek. Kurd îroj şîna wî digirin. Hûn dixwazin çi bibêjin?***

-Aram Tîgran, li gel 75 saliya xwe jî, dixwest ji bo kurdan tiştek bike. Dixwest stranên nû çê bike, muzîkên nû durust bike. Û digot: “Em dê rojek teqez bigihêjine azadiya xwe.” Min rojek jê re got: “Ji te re çi? Em ermen in.” Bi min re xeyidî bû û got: “Tu çi dibêjî? Belê ez Ermen im. Ez nikarim dînê xwe înkar bikim. Lê ev 50 sal in ez bi Kurdan re me. Ez perçeyekî Kurdan im. Ez neferekî vê têkoşînê me. Dê rojek teqez welatê me azad bibe.” Di van demên dawî de timî li benda daxuyaniya Abdullah Ocalan a 15ê tebaxê bû. Meraq dikir ku gelo dê çi bêje. Aram heya nefesa xwe ya dawî jî, ji bo gelê Kurd xebitî.

Ji ber wê ye ku ev du heftî ne kurd li ser lingan in. Li seranserê cîhanî şîna wî tê girtin, bîranînan li dar dixin. Ev ne tiştên piçûk in. Ev ji bo me şanazî ne, taca serê me ne. Ez bê sînor spasiyên xwe ji bo gelê Kurd pêşkêş dikim. DTP pir xebitî. Ji bo wesiyeta wî bînin cîh, pir hewl dan. Em ji hemiyan re minetdar in.

www.arsivakurdi.org

# Pirtûkxana Kongirês
# Pirtûkxana herî mezintirîn di cîhanê de ve

Ev pirtûkxana ya herî mezintirîn , herî buhatirîn , û herî parastî di cîhanê de ye . Ev hevoka li ser quba avahiya " Tomas Cîvirson " – avahiya serekîn ya pirtûkxana Kongirêsê ye – neqşandiye . Herweha ew avahiya li Waşinton ji deverên herî berz e . Bergeha wê /39/ hiktar e , dirêjahiya refikên wê /856/ km e , /130/ milyon berhemên curecur lê heye , jê /29/ milyon pirtûk û berhem bi /460/ zimanî çapkirî ye , û bêtirî /58/ milyon belgeyî jî lê tê dîtin . Û ew di cîhanê de mezintirîn jêder ji berhemên zagonî , nexiş , fîlm , û sazên mozîkê re ye .

Ew li sala /1800/ z , ji bo xizmeta endamên Kongirêsê hate damezrandin . Buhayê berhemên ku bi wan dest pê kirî , bi qaserî /5000/ dolar bû . Avakirin û damezrandina wê , vedigere serokê sisiyê ya Emerîka Tomas Cîvirson . Tomas Cîvirson nivîskar , dîplomatîk , zagoner û endezyar bû , û ew curezîrekiya di siyasetvanekî zîrek de hatibû civandin . Ji ber zîrekiya wî , serokê diwem ya Emerîka " Con Adem " ew kir cîgirê xwe . Cîvirson yekemîn zagon bo danasîna rola pirtûkxanan , ku îro pê radibe derxist .

- **Avahiyên pirtûkxanê :**

Pirtûkxane weke dûmahîkekê bi avahiya kongirês ve ma girêdayî . Piştî ku Ingilîz , li 24.8.1814 pirtûkxane tevî berhemên wê şewitand , avahiya pirtûkxanê fere kirin , û li 30.2.1815 an , pirtûkxana Tomas Cîvirson hate kirîn , û şûna yên hatine şewitandin dagirtin . Lê dîsa ma perçak ji avahiya Kongirês . Li sala /1851/ an dîsa pirtûkxana kongirês hate şewitandin , û dora /35/ hezar pirtûk ji tevaya /55/ hezar pirtûkên pirtûkxanê şewitî . Sedema wê şewitandinê jî şaşiyek di yek dûmankêşên wê de bû . " Tomas Waltir " pilanek bo avakirina beşekî nû ji şênberên netên şewitandin ji pirtûkxane re , pêşkêşî Kongirês kir . li 23.8.1853 an , di şahiyek mezin de , ew baska pirtûkxanê hate vekirin , ta ku rojnamegeriyê bi " mezintirîn basik di cîhanê de " bi nav kir . Li sala /1865/ an , parêzvanê pirtûkxan " Enswors Pand Spoford ", erêkirina zêdekirin du paskên nû li pirtûkxan , ji Kongirês bir . Li sala /1870/ ê , " Spoford " zagona xistinê , ya ku mafê daneran diparêz derxist . Tiştê hîştî , ku ji her pirtûkxana niştimanî ji Emrîka re . Wê zagonê hîşt ku berhemên pirtûkxanê gelekî zêde bibin , û nema refikên wê têrê bikin , ji ber wê " Spoford " Kongirês bawer kir , ku pirtûkxanê biguhêze avvahiyeke nû , û bi rastî jî Kongirês li ser pêşinyara wî erê kir .

- **Avahiya Cêvirson :**

Tiştekî xwezayî bû ku danûsatndinek li ser wê avahiya nû çêbibe , ya ku biryara pilankirina wê nebû ta sala /1886/ an , li ser destê " Con Simêsir û Polpîlz " , û ev avahiya bi ser nebû , ta sala /1897/ an . Ew bi pirtûkxana Kongirês an Pirtûkxana Serekîn nas bû , ta ku , li 13.3.1976 an , di şahiya bîranîna zayîna " Cêvirson " de , bi beşdariya serokê Emerîka " Cîrald Ford " , bi pirtûkxana " Cîvirson " hate bi navkirin . Di vekirina wê de , wê giyana Emerîka ya nû dinimand , herweha bû simbolek û şopwareke netewî ji dewleta Emrîkî re . Dora /50/ î hunermend û kolankerên Emerîkî di neqşên wê de xebitîn . Bi rastî ew avahiya ya herî bêtirîn dilsoziya çanda kilasîk dikir , bi şêwakî hemî pirtûkxanên Ewropî yên navdayî derbas kir .

- **Avahiya Ademz :**

Li sala /1928/ an , li ser daxwaza parêzvanê pirtûkxana kongirês birêz " Herêrt Betman " , Kongirês li ser kirîna xakên Rojhilatî pirtûkxana serekîn erê kir ; ta ku , dûmahiyek nû ji pirtûkxanê re bê avakirin . Li sala /1930/z , ji bo avakirina wê û rêgirêdanek bi nerd di navêna wê û avahiya serekîn de , û zêdekirina paskek nû li aliyê Rojhilat ji avahiya serekîn , ji bo taybetmendiya pirtûkên entîke , pîvandeyeke diravî hate bêlî kirin . Hevpişikgeha " Pêrson Siwîlson " bi alîkariya endezyarê şêwirdor " Eliksender Pol Sirowbirêdc ", bi şêwakî kilasîk a hêsan , pilana wê avahiyê çêkir . Li sala 1938 an avahî hate vekirin , û li 3.6.1939 an ji cemawer re derî hate vekirin . Li deriyên wê , kesên dîrokî bi bironzê , li destê kolankerê navdar " Lî liwîr " hatin neqşandin , ta ku aliyekî ji dîroka mirovatiyê bibêje. Li sala /1980/ ê , D.R.(10)

www.arsivakurdi.org

## Dmahîk: Pirtûkxana Kongirês

navê serokê diwem ya Emrîka " Con Ademz " li avahiyê bû .

- **Avahiya Medîson :**

Ta niha pirtûkxana Kongirêsê mezin dibe , ta ku " kwins Miyomford " neçar ma , ku pirojeya avakirina avahiyek siyem , li sala /1957/ an pêşkêş bike , li sala /1965/ an erêkirin avakirina wê bistîne , û kevirê bingehîn li sala /1974/ an dîne . Lê nehat vekirin ta sala /1981/ an bi beşdariya serok " Ronald Rîgên " . Û ew avahiya bi navê serokê çarem " Cêms Madîson " , bi nav bû . Kolankerê navdar " Hankok Waltir " pûtek ji Madîson re çêkir , û li ser dîwarên derdora pût , heyşt gotinên wî yên navdar li ser azadî , fêrbûn û zanînê kolan .

- **Berhem û arziyên pirtûkxana Kongirês :**

Bi kurtî li serjimara di oêşgotinê de hatî vegere ger tu dixwazî wê nas bikî . Lê , xelik ji hemî deverên Emerîka û cîhanê seyrana wê dikin , ji ber ku di nav xwe de piraniya dana ramanî , çandî û huneriya ademîzadiyê yên di navbera pir çerxan de hatine dicivîne . Ne tenê weha , ew pir perçeyên kevneşopî yên mezindarên Emrîkî jî di hundir xwe de kom dike jî .

Serok " Tomas Cêvirson " yekemîn Mishef wergerandî , li sala 1765 an wergirt . Serokê beşê daneriyê di pirtûkxana Kongirês de , guman dike ku serok " Cêvirson " ew Mushefa kirî , ji ber ku lêkolînên wî yên zagonî , pirî caran wek jêdereke Islamî nîşanî " Qurana " pîroz dikirin . Û " Mar" dibîne ku " Cêvirson " ronakbîr bû , û ne biyane ku ronakbîrekî weke wî hewil bike felsefa sincî yên olên din nasbike .

Wergera ku " Cêvirson " bi dest xwe xistiye , wergerandina " Corc Sîl e " , û ew yekemîn wergerandin bû , ku yekser " Quran " ji Erebî wergirî Ingilîzî . Hemî wergerên berî we , ji zimanê Firansî wergirîn Ingilîzî , wêlomê ji jihevş'etîbûn . Mushefa wergerandî di " Pirtûkxana Cêvirson " de , bi Mushef ". Dora /300/ hezar pirtûk bi zimanê Erebî û zimanên Rojhilata navîn ên din heye .

Cêvirson " bi nav dibe . Di beşê Rojhilata navîn û Efrîqiya de , li ser deriyên wê navên pêwîstirînê bajarên Erebî hatiye nivîsandin Ev beşa , di avahiya " Tomas Cêvirson " de ye . Yê ku di nav de eywana " Asiye " , eywana " Ewropa " û navvend a belgekirina Yabanî dicivîne . lê eywana serekîn ya xwendinê di avahiyê de , ji beşê zanînên civakî û mirovatiyê re hatî taybetkirin . Û ji beşên vê avahiyê , eywana Mîkrofîlmê û eywana pirtûkên kêm têne dîtin û giropên taybet . Û di avahiya " Cêms Medîson " de jî , eywana xwendina Efrîqiya û nexşan , pirtûkxana zagonê , sînemalivok , filmên tilivizyonê , û eywana weşanên gerok û rojnaman , û herweha eywana huneran û eywana çapemeniyê û wêneyan heye . Û di avahiya " Con Ademz " de jî eywana xizemguzariya bazirganiyê û eywana zanîn û tênîlociya heye .

Di pirtûkxana kongirês de , mezintirîn pirtûkxana bi taybetiya zagonê heye , yanê dora (4.2)milyon belgeyî tê dîndin . Ew jî vedigere rola ku ji bo wê ev pirtûkxana hatiye damezrandin , ku weke pirtûkxaneyeke jêderî xizmeta endamên Kongirês bike . Weha xelkê Emrîka xwestin dewleta xwe li ser bingehên zanistî damezrînin . Herweha di wê pirtûkxanê de , mezintirîn çapemeniyên pêşî yên Ewropî , wek sed pirtûkên zarokan ên tewrî entîke di cîhanê de , çûktirîn pirtûk di cîhanê de , ya ku pelên wê bi serê derziyê tê qulibandin , û mezintirîn pirtûk jî lê tê dîndin . Û weha /0.2/ milyon dengên hatine wergirtin ( seclandin ) heye , yanê cîhan tev bi zanînên xweve , di vê pirtûkxanê de ye , û roj ji rojê jî pêşve diçe . Bi vê rengî miletên li pêş ne tenê pirtûk û zanistiyên cîhanê kom kirine , wan xwendine jî . De ka em Kurd jî hinekî şopa van miletan bigirin , bi pê zanîn û zanistiyê kevin .

**Kovar Elerebî , hejmar /600/ . 2008 gotara Dr .Xalêd Ezb . Wergerandin : Memê Alan**

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Her dice…..**

bêkarî, balavbûna nexweşiyên civakî li her cih û warî balav bûne, mixabin ku hin ji wan bi pilan di civaka me de têne bicihkirin!!. Ji par û virde, ango piştî bikaranîna fermana Komarî nimre 49, xizaniya deverên Kurdî dubare bûye, nêzîkê (15-20)% ji xelkên me gund û bajarên xwe berdane û ber bi bajarên mezin ve çûne, qûtê rojê peyda dikin û yên mane jî, di rewşeke pir aloz de dijîn, eger derfetek ji wan re peyda nebe, ewê jî xaka bav û bapîran berdin, gund û bajarên xwe kavil bihêlin!!..

Bi rastî, ev gunehkarîke mezin û tewaneke ne mirovane ye dijî hebûna gelê me tê birêvebirina, li ti welatan, di ti zagonan û ti olan de rêdanek nayê dîtin ku miletek toşî şerê birçîkirinê bibe, piçûk ji nêza bimrin, zarok ji dibistanan derkevin û li kolanan karên xirab bikin!!.

Paşeroja gelê me yê Kurd bi taybetî û ya gelê Sûriyê bi gelemperî di metirsiyeke mezin de ye, giringe hemî rewşenbîr, siyasetvan û kesayetiyên welatperwer ên Sûriyê dest bidin hev, bi berpirsiyarî li gora karîn û zanînên xwe, gelê xwe hembêz bikin û wî ji vî şerê reş biparêzin, bi dil û can, ji bo bidestxistina berjewendiyên wî kar û xebateke îjdil bikin, ji ber ku çîrok ne ya rebenê **Dilo** bi tenê ye, lê belê ew ya hizarên mîna wî ye!!.

**30.08.2009 Z-2621K**

**Dumahîk : Pirsa Kurd....**

û destpêkirina xwendin bi zimanê Kurdî di zanîngehên Turkiyê de û wd, hin gavên baş û bicî ji bo xurtbûna nîve demokrasiya Turkiyê û encama wan hewl û bizavan bû bingeha destpêkirina pêvajoyekî nû ku di vê mehê de kete rojevê, gellek helwêst û daxuyaniyên ku çaverê nedihat kirin zû bên cîbicîkirin, derketin holê.

Giringiya vê pêvajoya nû di wê yekê de ye dawiyê bi proseya bive û qedexebûna baskirin li ser Doza Kurd û binpêkirina mafê mirovan û mîlîtarîzekirin û bêpariya dever û bajarên Kurdistana Bakur û pirsgirêkên wan hatiye û tê û ew tilisma dîroka hemdem a Turkiyê hatiye şikandin û dîwarê înkarkirina dehan salî a wê pirsa rewa ya welatê Turkiyê ji holê rabû. Wê pêvajoya nû pêwîstî bi cidiyet û kar û mekanîzm û projeyên piratîkî û ron û herwiha domandina gotûbêj û hevdîtinan û çareseriyên demokratîk û aştiyane û siyasî heye.

Ligel wê yekê ku Turkiyê Konvansyona Mafê Mirovan ya Ewropayê û çendîn peymannameyên din ên navnetewî îmza kiriye, lê hê wî welatî xalên Konvansyona Ewropî a Parastina Mafê Kêmaniyan nepejirandiye û di wê derbarê de berdewam ji ber binpêkirina mafê mirovan, bi taybet çaresernekirina pirsa neteweyî a Kurdan di Turkiyê de rûbirûyê rexneyên tund bûye. Hewl û pêngavên vê dawiyê ji bo çareserkirina Pirsa Kurd li Turkiyê ji rêya aştî, gotûbêj û siyasiyane ve dibe sedema cihgirbûna demokrasiya rasteqîn li Turkiyê û alîkariyek baş bo pêvajoya endambûna wî welatî di YE'ê û wergirtina Turkiyê wek endam di wê yekîtiya bihêz û xurt a cîhanê de ku ji boTurkiyê pirr giring e.

Çareserkirina Pirsa Kurd li Turkiyê pêwîstî bi qebûlkirina rastiya hebûna wê doza rewa û herwiha pêngavên cidî û piratîkî û çareseriya bingehîn heye û niha ji qonaxa gotin û dirûşman derbas bûye

***Tîbên : Ev gotar ji kovara AGIRÎ, Hjmar 117 hatiye girtin***

www.arsivakurdi.org

# Her diçe
# Xizanî li deverên Kurdî pirtir dibe!

**Rêberê Silîvî**

Dema ku **Dilo** derbasî nivîsgeha min bû, ez bi tenê bûm. Piştî pêşkêşkirina rêz û silavan, bêdeng ew li hemberî min rûnişt. **Dilo**, dostekî min î navser e, bi temenê xwe 43 salî ye, bavê sê kur û du keçan e, ew ji rûniştvanên herêma Cizîrê ye û karê wî avakirina avahiyan e, di karê xwe de hostekî bi nav û deng e, zîrek, jêhatî û dilsoz e.

Wê rojê, ew pir xemgîn bû, melûl, hejar û baskşikestî bû, te digot qey wî hemî barê dinyayê li ser milên xwe hilgirtiye!! Xizanî û perîşaniya tevaya cîhanê di awirên wan çavên wî yên ku di qoqê serî de kûr çûbûn dihate dîtin. Tiliyên destên xwe yên gij û zivr dirêjî çixarakê kir, agir berdayê, dû û dûman bi ser serê xwe xist û kûr diponijî, ew di derya xem û xeyalan de noq bûbû!!

Bi dengekî bilind min jê pirsî: Ha hevalo te xêr e, çi hatiye serê te tu ewqas xemgîn û bi keser î?. Ji dengê min ew veceniqî, bi dengekî zîz li min vegerand û got:

" Ma çawa ezê xemgîn nebim birayê min!! Ma çawa ezê xweliyê li serê xwe nekim! Bi navê xwedê yê şêrîn, ji ber bê kariyê ez bê hiş û bê sewdan im, vir de diçim, wir de dibezim, tu kar bi destê min nakeve, îde ji derdê destengiya malwêran, ez ji kufletê mala xwe şerm û fihêt dikim !!. Bawer bike, eve derdora 25 salan e ku ez vî karî dikim, tucarî ez ne ketime rewşeke wiha xirab û kambax. Bi rastî, ez nema dizanim çi bikim, bi kû ve herim û rê li ber min winda bûne.



Carê, hê beriya ku min avahiyek kuta bikira, yek yan dido li benda min bûn, karê min pir bû, ez di ber re ne digiham, lê îro, dîtina karekî ji min re bûye xewn!!. Beriya demekê, ji bo dîtina karekî ez çûbûme bajarê Şamê, kar li wir hebû, lê ew pir erzan bû, pereyên wî têra nanûzikê jî ne dikirin!! Rabû ez vegeriyam, ma ez çawa bikim biracan?. Ev cîhana fireh a mezin a bê sînor li serê min belengazê xwedê teng bûye..!!"

Xwendevanên birêz, ev ne xewn, ne çîrok, çîvanok û ne jî xeyal e, ne jî ew ji afirandina hişê min e, da ku ez dilê we bi rewşa belengaz û perîşanan bişewitînim, lê belê, ew wêneyek ji jiyana gelê me ya rojane ya rasteqîn e.

Bi rastî, ji ber projeyên çewsandin û birçîkirina gelê me yê Kurd, digel ziwabûna erd û ezman, rewşeke pir aloz di deverên Kurdî de rû daye, xizanî,

D.R. ( 11 )

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de**

www.arsivakurdi.org